



Welat

Hejmar (5)

15 Cotmeh 2013

Çandî - Giştî - Serbixwe - Nivmehane ye



welat.press@gmail.com

www.facebook.com/Dengekurdistanasurya





Rojnamevanên Rojava

Herî dawî hewldana damezirandina yekîtiyeke nû di nav rojnamevanên rojavayê Kurdistanê de li Hewlêrê paytexta herêma Kurdistanê hate kirin lê ev hewldan dûr ji rewşa aloz ya siyasî li rojava nemaî hin aliyên gotin ev kongira navborî li jêr çavdêriya aliyekî siyasî bû lewra w; nikarîbû bigihe armancên xwe î û aliyê tawnbarkirî jî berevaniya xwe kir û got ku ew ne layingirê ti hêzeke siyasî ye û wisa ev hewldan negiha tiştê dihat jê xwestin ê

Di demke wisa hestiyar de ji dîroka kurdên Sûriyê dihat xwestin ku neynika vî milletî li ser lingên xwe sekinîba û hemû aliyên siyasî çî Encûmena Gel ya Rojavayê Kurdistanê an jî Encûmena Nîştîmanî ya kurdî karîban ku



gotin î kar kiribî çî li hundirê sûriyê an jî li derveyî wê herweha yekîtiya rojnamevanên rojava eger çûba serî dê karîba doza kurdî bi wî rengê wê yê dadmend ji Sûriyan û cîhanê re ragihandibaê Astengiyên ku ketin pêşiya kongira rojnamevanên kurd li Sûriyê li Hewlêrê û negihana wê bo armancên xweî div; nebe kelem li ber hewldanên nû ku karîbin neynika vî milletî ji hev nêzîk bike ku ev hewldan bibe ya pêşî li ser riya jiyanê deomqrat di jiyana kurdên Sûriyê de

gotin î kar kiribî çî li hundirê sûriyê an jî li derveyî wê herweha yekîtiya rojnamevanên rojava eger çûba serî dê karîba doza kurdî bi wî rengê wê yê dadmend ji Sûriyan û cîhanê re ragihandibaê Astengiyên ku ketin pêşiya kongira rojnamevanên kurd li Sûriyê li Hewlêrê û negihana wê bo armancên xweî div; nebe kelem li ber hewldanên nû ku karîbin neynika vî milletî ji hev nêzîk bike ku ev hewldan bibe ya pêşî li ser riya jiyanê deomqrat di jiyana kurdên Sûriyê de

Aras Yûsiv



ÇIMA KURD BÊ SEROKATÎ NE *

Eger ku, em li dîroka miletan vegerin emê bibînin ku, sê giropên civakê yên bingeîn hene ku, ew bi roleke mezin, di damezrandin û pêşxistina civakê de, rabûne û radibin û helbet girîngiya ewana jî ji kar û xebata wan tête. Ev hersê girop jî û bi kurtayî, em dikarin bêjin ku evin; rewşenbîr, olperest û kesên dewlemendin, weke dibêjin: mîrên pera û karan e.

De ka em vegerin rewşa xwe û bipirsin; çima em wilo li şûnin û çî dihêle em ji hev bişelin û pereng-perengî bibin. Di dîtina me de, yek jî sedemên sereke ji rewşeke wilo re, tinebûna ewan hersê giropan, an jî bi kêmanî, tinebûna rola ewan sê nîfşan û qelsî û ne li hev kirina ewan hersê giropên ku, me bi nav kiribûn.

Ger ku, em vegerin rewşenbîrê xwe û di nav de siyasatmendarên xwe jî, emê binirin ku, ew di destxistina alavên xwe yên zanistiyê û bingeha xwe ya ramanî de, pir li şûn û lawez in. Helbet ev pîvan dê bi rewşenbîrên miletên derdora me ra be û ne hemberî ewê ewropî be. Tiştê din ku, dihêle ev giropa bêtir bête pişafîn û rola wê kirêtir bibe, ewên nîvrewşenbîr û gihêştine cihên serdestiyê û rêvebiriya evî miletî, di riya lédana çepikan, çî ji evî partî re be yan jî ji yê din re be û helbet kesin xwedî ev ton sinc, dê tirsonek û dûvdehol bin, lewra dê ti carî tiliya xwe dinen ser birînê û tenê jê re pêwîste ku, danîştok di binde neheje, bi gotineke din; kar û îşê wî bimeşe.

Giropa dudiwan, kesên olperestî, ewan camêran jî û ji roja-roj de xwe weke dûvik ji rêjîm û serdestiya miletê serdest re didît. Tevî ku, em ji bir nakin, ew hin caran jî li hemberî ewan destlatiyan rabûye jî, lê ew yeka jî di bin akama hinek sedemên taybet de û bêtirî ewan sedemên jî bi kartêkirina ewana ya mewdanî ve girêdayibû. Û wilo ewan jî û weke hemû Kurdan, konevaniyek an jî ya rast sinciyeke dîrokî ku, em tev di bin ewê de dilivin, bi kar anîye ku; em Kurd koleyên dîtî û baweriyên ku, ji derve ji me re têtin û em hertim xwe ji ewan dîtî û baweriyên re dikine kole û raja wan û xwediyên ewan dîtînan dikin û ne ewan dîtînan dixin raja doza miletê xwe da, weke ku, çawa miletên cihanê dikin û mînak weke ku me berê jî gotiye: Ola Îslamê ye ku, hemû miletên din, ev ol ji xwe re kirin pire û di riya wê re doza xwe bi ser xistin. Lê tenê me Kurdan, me xwe



ji wê re kir pire û ew di riya me re gihêşte doza xwe, belê û weke me got; ewan camêran ev sinc, bi cih anîne, lewra ti kar di ber milet û doza xwe de nekirin e. Ma ew kesên me yên zengîn û dewlemend, ew jî du par û celebî; hinek ji wan ate û kokdarên me ne, ewan camêran nizani raja kesayetiya xwe bikira, piraniya ewan; vêca dê çawa zanibin xizmetê miletê xwe bikin û pir kes ji ewana dûvikên serdestan e û nexeme kiye ewê serdest û ewana hemû tişt windakirî heya rêzgirtina xwe ya kesayeti. Para din jî evên nuh ku, di roj û şevê de û di riya dizî û çilekiyê re gihêştine jor û ev jî, li gor dîtînan me, dê netenê dûrî milet û dozên milet bin, lê ewên wî dadiqurtînin jî û ew ji pêşî de dûrî sincên xebatkariyên e.

Û wilo em dighên ewê encamê ku, em miletekî bê rêber û serokatîne; weke mirovê bê serî û helbet dê liv û tevgera me jî bê kar û sûde be. Lê ji berî ku, em gotara xwe kuta dikin, em du tiştan tinin bîra xwe; ya pêşîn, rola ewan dewletan û konevaniya ewana ku, me têxin rewşeke wilo, da ku, em bi canê hevkevin û şerê bi wî re ji bir bikin û bi şerê nav xwe biguhêrin. Xala din jî, mebesta me ji evê gotarê, ne ewe ku, em cihan û jiyanê li ber çavên xwe û milet reş bikin û bêjin: ev yeka qedera me ye û Kurdo destan ji ber xwe ber de. Na, qet merem ne eve, bi qasî ku, em karibin tiliya xwe deynin ser birînê, emê karibin zûtir bighên çareserkirina ewan pîrsgirêkan; eger ku, tu tiliya nexî hundirê birînê û nekolî, da ku, ew êşa bihêle xwediyê birînê biqîre, ewê li dermên negere.

(*) Belê piştî evqas serok, miletê me hine jî bê serokatiye

Pîr Rustem

(*) Belê piştî evqas serok, miletê me hine jî bê serokatiye





EM Û SALÊN ME

Bi dîtina te, li dû çend salan mirov dikare wek pîremêrekî yan pîrejinekê bihêt binavkirin?

Di rojên zarokiya min de jin û peyayên ku temenên wan digihîşt 50 salan êdî wek pîrejin û pîremêr dihatin binavkirin. Bêguman li tevahiya herêma Rojhilatê Navîn û gellek welatên din jî weha bû. Tew li hinek herêmên belengaz pir kes li dû 30-40 salên jiyana xwe bi encama nexweşiyên dimirin.

Îspatên di dest de çi gumanan li holê nahêlin ku dirêjya temenê piraniya mirovan bi rewşa jiyana wan ve girêdayî ye. Fermo em bala xwe bidin vê nimûneyê: Li gor hejmarên fermî yê britanî, di rojên îroj de tenê 2.3% ji hemwelatîyên britanî ber 36emîn roja jidaybûnê dimirin; yanê ji 1000 kesan 23. Ber 120 salan, li milê din, 43% ji hevvelatîyên Brîtanya; yanê ji 1000 kesan 430 ber 36 salin bibin dimirin.

Di qonaxa îroyîn ya cihana me de, mirov zêdetir dijîne. Bi encama hebûna dermanên li dij mîkroban û nexweşiyên, pakirina avê, baştirkirina rewşa tenduristî û hêsanbûna şert û mercên jiyane, temenê mirovan (umrê wan) li gelek herêmên cihana me zêdekirî bûye. Lê li beşîna Afrikayê, Asyayê û Amerîkaya Latîni hîn îroj jî gelek mirov bi encama nexweşiyên û dijwarbûna şert û mercên jiyane zû dimirin, yan zû pîr dibin (Li hinek beşên Afrakayê hejmareke bilind ji xelkê hîn îroj jî bi encama nexweşiyên wek AIDES di bihara jiyana xwe de dimirine). Li welatên pêşkeftinî û dewlemend, li milê din, mirina bi encama nexweşiyên ji birçîtiyê û nepakiyê dihên zor kêmtir bûye. Li milê din, mirovên bi temenên 50, heta 60, salan nema wek pîrejin û pîremêr dihatin binavkirin. Li Swêdê, bo nimûne, hejmareke ji hevvelatîyan ta 108 salan dijîn. Li Australya jin bi pirranî ji 80 salan bêtir dijîn. Jê bêtir, bi encama werzişê, xwarina taybet, bikarhanîna dermanan û emeliyatên bedewkirinê hejmareke bilind ji jin û mêran bi temenên 60 salin jî hema-hema ciwan

xuya dikin. Nuha lêkoler û pîjişkên pispor wê bizavê dikine ku dermanên zêdekirina temenên xelkê çêbikin.

Amanca pîjişk û lêkolerên pispor dîtina dermanekî ye ku bikaribe biçûktirîn beşê giyanî di mirovî de vejîne. Yek ji van dermanan li kurman hatiye ceribandin û temenên wan dirêj kiriye. Li gor pisporan, di kurmekî de 959 “xeliye” hene, lê di mirovekî de 100 000 milyar “xeliye” hene. Ev cudatiyeke pirr û pirr mezin e, lê cudabûn kêmtir dibe dema em “cînên” (jeans) kurman didin hember “cînên” mirovan. Di kurmekî de 19 000 “cîn” hene; di merovekî de 30 000. Bi gotineke din, “cînên” ku ji nîfşên berê derbas nîfşên nû dibin li nik mirovan tenê bi 11 000 “cîn” ji kurman zêdetir e. Zanyarên di vî warî de pispor wê bizavê dikine ku ji vê yekê bigihên amanceke ji bo dirêjkirina temenê mirovan bi sîd.

Lê gelo her mirov bixwaze ku temenê wî ji 100 salan zêdetir be? Li gor gotareke ber çend hefteyan di rojnameya Sydney Morning Herald de hatî weşandin, hejmareke ji mirovan dixwazin, lê gelek mirov naxwazin. Tiştê herî grîng ji bo gelek mirovan jiyana bi kalîte ye, ne dirêjîya wê; yanê ew dixwazin di jiyana xwe de li ser xwe bin, rewşa wan ya tenduristî baş be û di têkiliyên cinsî de bextiyar bin. Li milê din, mirovine bijarte hêvîdar in ku di salên jiyana xwe de ji bo cihanê bi sîd bin, ne ku sed salan bijîn û çî sîdê ne bigihînin cihana ew tê de, ne jî mirovên ew li gel wan dijîn.

Dema mirov derbarê pîrsên weha de agahdar dibe, mirov bi rastî jî dest pê dike di şeweya jiyana xwe de biponije. Ez bi xwe gelek caran ji xwe dipirsim: Gelo ev jiyana çi didêye min e; û gelo ez çi didime vê cihanê ye? Her ku nasek dimire ez dibêjim xwe, ez ê şeweya jiyana xwe biguherim, lê dirêj nake mirin dîsa ji bîr diçe. Heke kesek ji min bipirse: Tu dixwazî temenê te ji 90 salan derbas bibe? Bersîva min ya îroj bêyî guman NA ye. Baş e, xwendevanê hêja, gelo bersîva te çi be? Tu hêvî bikî ku temenê te bigihê 100 salan? Heke bersîva te “erê” be: Wek xelkê me dibêje, “Xwedê umrê te zêde bike!”

Şahîne Bekirê Soreklî





GUHERTÎN



Diyar e ku Guhertin Navnîşaneke giştiye , bi bandor e li ser tevaya Jiyana Mirovatiyê û ji Bûnê de bi Jiyana Mirov re jiya ye , çiku Guhertin ji Xwezîniyan der tê ?..

Lewra jî dema ku mijara Guhertinê tê gotin û Guftûgokirin , li kuderê be û di çî çax û demê de be û li ser çî Astê û Çiheyê be , diyar dibe ji Mirov re , ku Xwezîniya Guhertinê xwe dide diyarkirin û daxwazkirin bi şeweyekî giştî û ji hêla her kesî ve , dêmek diyar e jî.. ku rewşên Nepak an Nexweş peyda dibin li cem her kesî û her kes mijûl û raman dibe bi Xwezîni û Xwesteka Guhertinê .

Belê çî ew Guhertin Xwezîni û Xwesteka Mirov ya di derbarê rewşa kesayetiya wî de be û an jî bi giştî di derbarê rewşa derdora wî û civaka wî de be , pê re jî.. çî ew Kesayeti xwedî rewşeke Xweş û Maldariyê be an Nemaldar be jî , .. ev e jî ji ber ku Xwezîniyên Mirovan an Xwezîniya Mirov Baweriyeke rasteqîne û Xerîziye , ji Suruşt û Xweristiyê ye , ji Bûnê de bi Mirov re Jiya ye û her û her daxwaza pêşketinê û serkeftinê û baştirîn Jiyankiriye û dike û dê bike , çiku ew Rasteqîne ya Xerîzî ya Xewzîniyên Mirov , ew bi xwe ya ku Dûlabê Guhertinê û pêşketinê digerinê û ber bi pêş ve dajo û her weha jî Jiyana Mirov û tevaya Cîhanê bi pêşveçûnan dajo û dike .

XWEZÎNIYÊN MÎROV RASTEQÎNEYEKE XERÎZÎ YE JÎ SURUŞT Û XWERÎSTIYÊ YE , HERDEM MÎROV DAJON BER BÎ PÊŞKETÎNÊ DE , DÎ JÎYANA WÎ DE Û LÎ SER ASTA HEMÛ TÎŞTÊN barê vê mijarê û mijara Guhertinê bi şeweyekî giştî .

DÎ JÎYANÊ DE

Diyar dibe ku mijara Guhertinê û xwesteka wê , ne ya min bi tenê ye û ne ya te bi tenê jî tê , qasî ku ya hemo Mirovan e , ji ber ku Xwezîni Baweriyeke Rasteqîne û Xerîzî ye , ji Xweza û Xweristê ye , her Mirov li cem wî peyda dibe û wî dajo ber bi Guhertinê û pêşketinê di Jiyana wî de û tevaya Jiyana Civakê û Cîhanê .

Lê ji bo min wek Mirov , çî sûd têtê girtin di der

Bawerim diyarkiriye.. ku bingeha Guhertina Rasteqîne , ew e ya ku ji kesayetiya Mirov dest pêdike û her weha di Civakê de jî belav dibe bi şeweyê xweyî Suruştî , yê ku di derbarê dan û standinên Mirovan di Civakê de û her weha di Cîhanê de jî belav dibe .

Dêmek gerekî û pêwistiya Guhertinê ji bo min heye , çî ku Giyanê min û Xwezîniyên min , doza Guhertina rewşa ku ez têde dijîm dike û daxwaz dike , ber bi baştir rewş ji bo min û li ser asteke bi giştî di jiyana min de , di derbarê rewşa Kar û Mal û Civak û Şehrîstani..T D .

Lewra jî dema ku ez Guhertinê dixwazim , çî Pêwîst e ji bo ku Guhertinên Tekezîrî û Bî-qîmet û Baştir bi dest bixînim di Jiyana xwe de .

Pêwîstî ew e.. ku Mirov Hişmend be û Înan û Baweriyeke Rasteqîne di ramanên xwe de biçîne , çiku ramanên rast û durust Mirov dajon ber bi Jiyaneke xweş û baştir , lewra jî Baweriya herî rast û durust , ew e ya ku Giring e ku Mirov di Hiş û Ramanên xwe de biçîne û ji xwe re bike Rêbaza ajoyên xwe di Jiyaneke de , ew Bawerî jî ev e ((JÎ HER SEDEMEKÊ RE EN-CAMEKE)) , çiku Amadekirin û danîna Sedemên rast û durust ji çî tiştî re be , dê wê Encamên wan jî weku hêvî û daxwazî ji Ewan dihat wê bête bi destxistin û Qezenckirin , ev bi xwe jî Baweriyeke Rasteqîne ye ji Sikolocya û Suruşt û Xweristiyê ye .

Lewra jî heger ku Mirov bixwaze û bi çî Guhertinan rabe an bi çî Karî rabe , pêwîst e di pêşîde ji xwe bi pirs e , ew dê ji boy çî bi wî Karî rabe û çî Encamê dixwaze jê Qezenc bike , lê heger ku Mirov Giringî dît ku Guhertinan bike an bi Karekî rabe , wê çaxê Pêwîst e ku Sedemên rast û durust ji wî karî re deyne û weku bingehe , daku Encamên weku ji wê Guhertinê û ji wî Karî têt û daxwaz dike bi dest bixe û Qezenc bike , çiku Sedem Nedurust kirî bin û neyên Durustkirin tu Guhertinên bi Qîmet nayên Çêkirin , ji ber ku Sedem çî be weku xwe Encam dide , Sedemên rast û durust Encamên wan jî rast û durustin.. û her weha Sedemên Nedurust Encamên wan jî bêguman Nedurustin .

NAVIKA SÊVÊ.. DENDIKA SÊVÊ , XWE BÎ KAR TÎNE DÎ JÎYANÊ DE WEKU DAREKE SÊVAN , ENCAMÊN WÊ JÎ HERDEM SÊVÎN Û NE TÎŞTEKÎ DÎTÎR E ?

Dêmek diyar e jî li ser asta Guhertinê di Jiyana Mirov de , ku Pêwîstî bi Avakirina Sedemên rast û durustin , da ku Guhertinên ku daxwaz dike , Tekezbîn û Encamên baştir bidin û weku Hêvî û Daxwazî ji wan têtê kirin , lewra jî ji Giringiyên herî Pêwîst jî bo Mirov , fêrkirina Bingehe danîna Sedemên rast û durust ji çî tiştî re be , ew bingehe jî Hişmendiya Mirov e , çî ku Hiş Sedema Sedemê ye ji her tiştî re di jiyaneke de û qasî ku Mirov xwe bi fêrkirina karê Hiş û wateyên wî bike , wê çaxê tenê wê Mirov Jiyaneke xweştir bibhûrinê û Sedemên baş durustkirî ji her tiştên ku daxwaz dike deyne û çêbike , çiku xwe Fêrkir û xwe Naskir wek Mirov di Jiyaneke de û xwe Avakir di Jiyana xwe de weku xwest û weku xwe .

Li dawî dixwazim bêjim hegr ku Guman çênebin , dibe ku di Gotareke dî de di derbarê hin Wêneyên Hişmendiye de em bi hev re bin .

Idrîs Pîran





Demsala xwendinê

Bi vegera demsala xwendinê û vekirina dergehên dibistan û zankoyan li Hin bajarên Sûriyê di demekê de ku rewşa Wê ber bi xerabiyê ve diçe û qeyran roj bi roj firehtir dibe ji ber şoreşeke berdewam heye.

Ji xwe tê zanîn ku çî şoreş hebe tenê bi çekdarî bisernakeve bê ku li nik tivingê pênuş hebe û li pey her şoreşvanekî rewşenbîrek hebe Lê li bajarê Amûde amadeya şagirtan û xelkên wê ji vekirina dibistanan re wê dê bi çî şeweyê be....????

Rast e Amûde heya dema îro rewşa wê aramî tê de heye lê tevî wilo astengî Li nik wan hene ji hêla abûrî û hin aloziyên in ve.

Xelkên Amûde pir zehmetiya dikişînin di Vê qonaxa ku îro têde derbasdibin Birîna ilikîrîkê û bandora wê li ser pêwariya karên rojane û bitaybetî jî buhabûna bê wate hişt ku xelkên vî bajarî neçarbibin.

û bi şewekî awarte jiyana xwe Berdewamdikin.

û piştî hevdişînên me bi xelkên Amûde re Diyarkirin ku me her sal bidilekî geş pêşwaziya vekirina dibistanan dikir Ji ber dibistan kaniya çand û perwerdeyê Mixabin îsal bi mgekî dîtir em pêşwaziya wê dikin ji ber em nikarin ji zarokên xwe re pêdiviyên wanî dibistanê ji cil,ber ,pirtûk û pênuşan dabînbikin.

Lê tevî aloziyên me yên abûrî hene erke li ser me ku em zarokên xwe bixwendin bikin wiha xwiya dibû ku pirê aloziyan ji ber rewşa abûrî ye ji bilî ku îro pirsgrîrêkin din xwe didin xuyanişkirin ew jî koçberiya sedan xelkê amûde koçberdibin biber kurdistanê başûr bi taybet piştî vekirina şinor û hin deverin din dinav wan de hene şagirtên dibistan û zangehan ne

û bi hevdişînekê bi şagirtêkî ji zanokya ferat li Dêrazorê gelo wê bi çî rengî xwendina xwe berdewambike????

Diyarkir ku îsal em qet nikarin xwendina xwe li Dêrazorê berdewbikin ji ber şer û cenga di bajêr de û gulebarankirina wê ji hêlal rêcîmê ve û bêhtir metirsiya rê û revandina xortên Kurd li ser nasnameya wan ew jî yek ji sideman ne û ne tenê xwendekarên zangoya Ferat van zehmetiyan dibînin ez bawerdikim hemû zankoyên li Sûriyê wê bi vî rengî bin

Vî şagirtî nîşankir û got niha hin ji me dikarin li bajarê Hesekê amade bibin ji bo ezmûnên xwe lê glo wê ev bajar aramî tê de hebe heta ku em sala xwe ya xwendinê berdewambikin.....!!!!!!

Ev tiştên ku me ji we re diyarkir dibin sedem ku dîsa ken ji lîvên zarokên Amûde barkbike û hêviyên ku li ser rûpelên pêşerojê rengin dikirin wêran bibin.

Alan alûcî

ji encamên rewşa rojavayê Kurdistanê

Çîmen Adil



Ji encamên rewşa rojavayê Kurdistanê gelek kes ji millet koçberbûn û bi hezaran çûne Bakur û bi hezaran berê xwe dane Ewropayê û bi hezaran jî li başûrê Kurdistanê bi cih bûne ,hin di konan de li kampên û hin ji wan jî li bajarên dimînin, xortên xwendekar û yên ne xwendekar bûne wek hev û yê sinetzan û bê kar ketine nav hev , û derfetên kar bi zehmetî peyda dibin û ji mecbûrî bi karên ne bi dilê xwe û bi mûçeyên kêr razî dibin û gelek astengî di pêşiya wan de derdikevin , min hevdişînekê kurt bi çend xort û keçên jî Rojava re kir û her yek ji wan nerîna xwe ji min re diyarkir . ji wan xortan: Rizgar 28 salî ji bajarê Kobaniyê ye , mamostayê zimanê Ingilîzî bû li bajarê Helebê , niha di hotêlekê de kardike û ji me re dibêje : ax ma ezê çî bêjim , di jiyana xwe de tucarî min hest ne kiribû ku ez şikestî bibim wekî aniha ,ji ber me mirovatiya xwe wendakir li wir ji ber bêhtirê milletê Kurdistanê me dibînin wekî kole , bi mûçeyên kêr û dan ûstandineke tirs me diêşînin.

Ciwan ji bajarê Qamişloyê ,xwendekarê zanîngeha Şamê ye sala 3an base Aborî .karker e , wisa diaxife: rast e ku Kurdistan baştrîn welate ji bo penaberên rojavayê lê ta niha jî Kurdistan weku millet pisîkolociya Kurdên rojanayê tenegehîştine .

Jiyan 25 salî ji bajarê Efrînê ye, mamostayê zimanê Erebî bû li rojava lê niha di Molekê de kardike dibêje : rewşa keçan li Kurdistanê cuda ye ,rast e ku derfetên kar bi hesanî dest wan dikeve lê zor astengiyên dibînin , ango di çanda Kurdên başûr de tiştêkî biyan e ku keç kar bike ,û gelek ji wan nerînen wan ji keça karkere zor ne başe ,ango di heşê gelek ji wan de ku keça ku razî bibe ku kar bike ew ê hemû karan bike ji bo vedandina peran , mixabin , ez bi hêvî me ku ev nerînen şaş werin guhertin . Kawa ji bajarê Hesekê 19 salî , ew di hotêlekê de wekî bîlboyî kardike ango tûr û çenteyan dibe odayên mêvanên hotêlê , ew ji mre got : tiştê baş ku min di Kurdistanê de dît ew e ku rewşa ewlekarî zor başe .

Dimîne ya rast ew e ku mirov li ser qada bav û kale xwe bimîne û dest ji wê tucarî ne berde . Ji ber hebûna mirov bi xaka wî bêhtir girêdana xwe heye ji xaka çî warin din be.



**Dayikek xweziya
mirinê dike ji ber
êşa zarokên xwe..**

Sadûn Sîno

Diya Ibrahîm dayika sê zarokên nexweş e (Ehmed, Mihemed û Beşar)..ev zarokên ji bilî êş û azaran jî tu tişt nedîne. ji roja ji-dayikbûna wan û rewşa wan a tenduristî xirab e.

Ehmed, û piştî zayîna wî bi du rojan bijîşkan girêkek di piştî wî de dîtin, ew xistina nexweşxaneyê da wî derman bikin û dilê dayika wî şabikin. lê piştî salekê nedikaribûn dermanekî baş ji wî re bibînin, ji ber ku ew girêka di piştî wî de êş belavkir ta giha serê wî, û di mejiyê wî de belavbû, û guhertineke berçav tê de kir. Û di lingên wî de jî ew êş xuyabû wek qulan ku elem ji wan derdihên, û di encamê de piştî ku temenî wî bû 13 sal êdî Ehmed jî nema dikare bimeşe.

Mihemed* navnîşana êşêke nû ye*

Derdê diya Ibrahîm ne tenê ev bû. dema ku zarokeke nû hate cîhana wan û ew î Mihemed binavkirin nexweşiyêke nû li laşê wî.



xuyakir, piştî 20 rojan ji zayîna wî, liva wî ne serastbû û dema ew pêş bijîşkekî kirin naskirin ku eêke giran di mejiyê wî de heye û derankirina wî qet tune.

Û kovana bavê mezintir bû ku bikaribe barê du zarokên nexweş hilgire.

mirin caran dilovantir e

Piştî wê bi du salan zarokeke nû ji wan re çêbû û navê wî kirin Beşar, û hêviya wan ew bû ku Beşar bê êş û nexweşî be, belkî ew hin şahî bixê dilê wan, lê mixabin ku rewşa wî jî weke ya bi-riyên wî bû.

Di dema ku me hevdiştin bi diya Ibrahîm re kir, ew ê dixwest ku êşa dilê xwe veşêre û hêsiyên çavên xwe rawestîne, lê dema ku peyla avê di destê wê de bû zaroka xwe av dida, nema dikaribû goriyê xwe êdî dûr bixe, û dest bi lavan kir ku êşa zarokên wê sivik bike. Ta ew ê dixwest ku Xwedan li wan bê rehmê û mirinê ji wan re bike derman.

Di dawiyê de hêja ye gotinê ku bajarê Dirbêsiyê wek hemû bajarên Kurdî yên din di rewş

eke aloz de dijî di warê tenduristî de, û ew jî ji pêwariya derman û navendên tenduristî hatiye.

**Rewşa tenduristî li
Serê Kanyê
kirîzeke berdewam e**

Xalid Şêxo



Bajarê Serê Kanyê li dirêjahiya deh mehan di rewşê mirovanti, aborî ewlekarî û tenduristî aloz û xirab de ye. û ya herî girîng di vê dema kurt a buhîrî de rewşa tenduristî ye.

Ji ber ku gelek ji Bijîşkan ji bajêr derketine û piraniya dermanxaneyan hatine girtin. û ta bi navendên tenduristî yên biçûk jî nema peyda dibin û Nexweşxaneya Netewî ji hatibû bombebarankirin ji hêla balefirên rêcimê berî salekê.

Û sedema wê jî gelek zehmetî ji şênayên bajêr re peyda bûne. û bitaybetî jî ji zarokan re di kêmbûna derman û şîr de. Tevî ku ew navenda tenduristî hewil dide ku bikaribe pêdiviyên peyda bike, lê tu tişt jî bi dest karmendên wê nakeve.

Di gereke meydanî me hevdiştin bi karmendên Heyva Sor a Kurd re kir û wiha rewş şîrove dikirin:

Rewş bitevahî aloz e. pêdiviyên tenduristî di bajêr de pir lawaz in. û sedema sereke ji wê re ew şerê ku li derdora Serê Kanyê li dar e. Û derketina Bijîşkan yek ji encamên vî şerî ne, û bûye sedem jî ku gelek nexweş bê derman dimînin.

Û ji ber ku herêm di şer de ye, ew dorpeçkirî ye, û ji wê ne derman û ne jî şîrên zarokan peyda dibin.

Û ew navenda tenduristî ya bi tena xwe li bajêr heye anîha, nedikare bi erkê xwe temam rabe, ji ber birîndarên topbarankirinê ji hêla komên çete ve roj bi roj zêdetir dibin. û êdî nema dikare wan derman bike.

Û di dawiyê de ewan taqez kirin bi pêwistiya vegera bijîşkan li bajêr ku alîkariyê bikin bi karmendên tenduristî re. ku bikaribin rewşê hinekî baş bikin û hewil bidin ku dîsa nexweşxaneya netewî vekin da bibe navenda dermankirina nexweş û birîndaran. bitaybetî jî ku zivistan nêzîk e. Û zehmeti-ymn wê pir hene.





MAF û korsên destûrê

Rêxistina mafên mirovan li Sûryayê (MAF) bi alîkariya komeleya Aferîn a jinên Kurd li dirêjahiya 3 rojan korsin di mijara destûrê de li darxist li navenda Subartu li Qamişloyê.



Kors bi rêvebiriya parêzer Mehmûd Umer endamê MAF hate li darxistin ji jin û keçan û tê de babeta destûrê hate şîrovekirin li ser gelek asteyan. Destpêkê danasîn bi destûrê û pêwistiya wê di welatan de wek belgeyeke yasayî ku karên di hundir û derveyê welêt bi rêxistin dike .



Alavên bikaranîna destûrê û zagonên ku pêkanîna wê bi cih bike, û erk û mafên mirovan di welêt de û avakirina dezgehên wî bi şêweyeke durist.

Mamosta Umer dibêje: dema ku gereke ji bo destûr bête bikaranîn dibe ku ne kêmtî 18 heyvan be û nabe ku bendên wê bêtin guhertin ji ber ku bikaribe xwe di civakê de bi cih bike û erênî û neyiniyên wê bêtin xuyanîkirin .

Evîn Mihemed wek şagitekê di van korsan de wiha axift:

Birastî me gelek sûde ji wan girt ku em bi destûrê û rastiyên wê dane nasîn, û çandeke nû ji bo me hate afirandin. Mehmûd Umer rêcîma siyasî di Sûryayê de ji dema kiralî û ta bi sala 1973an şîrove dikir û çawa ku di wê salê de destûreke nû hate çêkirin lê ne li gorî nerîn û daxwaziyan mîlet bitevahî bû.

Û piştê jî qala peymanê mafên mirovan kir ku çawa ew destûrên di dema desthilatdariya rêcîma Baas ji wê peymanê dûr in.

Edla Umer weke mafnasekê ku beşdarî van korsan bû li ser giringiya wê ji me re axift:

Me naskir ku destûr bi çi şêweyê tête afirandin û erk û mafên mirov ku çawa ji hev cuda ne. Di dawiyê de mirov dikare bibêje ku çanda yasayî pêwîst e ku bçte belavkirin di civakê de û mîlet bi hemû rengên xwe fêrî vê çandê bibin .

Îmad Talatî

Dadmendiya veguhezyane

Dadmendiya veguhezyane wek têgeheke nû li ber guhê gelê sûryayê dikeve , hîn têgeheke ne zelalkiriyê , lê di dema dawî de gelekî behsa wê ji hêla siyasatmedar , çalakvan û ragihanidê ve tê kirin . gelo Dadmendiya veguhezyane çi ye ?

Ew Komê ji kiryarên dadwerî û nedadwerî ye , mîna dîvketinên dadwerî , komîteyên rastiyê , bernamêyên bijardina ziyanan û çaksazkirina dezgeh û saziyan , yên ku li gelek welatan hatine bicîanîn bi mebesta çareserîkirina zêdegaviyên ku li welatîyên wê hatibûn kirin .

Girîngiya Dadmendiya veguhezyane tê ji mafê qurbanîyan di sizakirina ew kesên ku zêdegavî li mafên wan kirine , naskirina rastiyê û bidesxistina bijardinan .

Tevî nûjeniya têgeh û bicîanîna Dadmendiya veguhezyane , lê hin destpêka bikaranîn wê vedigerînin piştî cenga cihanê ya duyemîn di ' dadgehkirinên Norimbêrgê ' de li Almaniyayê , ya ku tawankarên cengê ji serkêşên nazîyan tê de hatin dadgehkirin. Lê destpêka rastî ji bicîanîna Dadmendiya veguhezyane re, di dadgehkirinên mafê mirovan li Yûnanstanê di salên heftêyî di sedsala çuyî de bû , û pişt re li Arcantîn û Çîlîyê bû derbarê komîteyên şopandina rastiyê di sala 1983 yan de li Arcantînê û 1990 de li Çîlîyê , û pişt re li gelek dewletên Emerîka başûr , Afrîka , rojhilatê Ewropa û Asyayê ta bi rojhilata navîn li Mexrib û Îraq û Mîsrê ya ku ta roja îro di vê pêvajoyê de berdewam e . bêti 40 ezmûnên bicîanîna kiryar û alavên dadmendiya veguhezyane li seranserî dunyayê li ber çavin.

Ji armancên ku dadmendiya veguhezyane dixwaze pêk bînin ev in :

- çareserîkirina perçebûna di civakê de.
- bicîkirina lihevhatinê û deribandina bîrnan.
- peydakirina dadmendiya ji qurbanîyan re û muhasebekirina ziyankaran.
- pênasîna bi zêdegaviyên ku li qurbanîyan hatine kirin.
- vegerandina desthilatdariya yasayê û çaksazkirina dezgeh û saziyan bo handêrkirina rengê demokrasîyê û mafê mirovan.
- misogerî bi nedubarekirina zêdegaviyan li mafê mirovan û xurtkirina aştiyê û pêkvejiyana aştiyane.
- xebat bo xurtkirina nîrxên dadmendiya û lihevatinê.

Di vî warî de dadmendiya veguhezyane hin kiryan bi kar tîne bo pêkanîna van armancan jî :

- dadgehkirinan , çi sîvîl yan tawankarî , nîştîmanî yan navdewletî , li hundir yan li derve be .

-sazkirina komîteyên şopandina rastiyê , ji bo destnîşankirina rastiyê û handêrkirina ziyankaran ku li ziyân û wêranîyên xwe mukir werin da ku ziybar dilaram bibim û karîbin lêborîne yan lêpîrsîna maf û çarenûsa qurbanîyên xwe bikin. Gelek komîteyên şopandina rastiyê û li gelek welatan hatin sazîkirin û her yek ji wan bi awayekî û li ser hîm û dirûsmekê hate avakirin , lê ezmûna komîteya Başûrê Afrîkayê (1995) encamin zêde mezin dan

- bijardina ziyankaran , çi bi rengê madî yan wateyî be , girîng ewe ku mirovê ziybar nîrxên miyoyetiya wî lê vegerin , û bawerîya wî bi avakirina civakê vegere.

-çaksazkirina dezgeh û saziyan û pakkirina wan ji şûmayiyên pêşelkeran û piştigîrên wan , û jinûsazkirina van saziyan (ewlekarî , artêş , saziyên sîvîl...h.w.d) da li gorî nîrxên sîvîl , demokrasî , yasayê bin.

-zindîkirin û vejyandina bîranînan , bo bîbîranîna qurbanî û hezkir û hejîyên ber dilê me .

Bêguman ev rêbaz re li ber kiryarên tolhildanê û perçebûna civakê digire , û pêşdebirina rengê sîvîl ji danûstandinê û bicîkirina yasayê xurt dike , lê ev yek nayê wateya ku kujer û wêranker ji sizakirine bifilitin û neyên eşkerekirin . kiryarên dadmendiya veguhezyane ne bi tena serê xwe ne , lê belê hemû bi hev re geş dibin û cihê xwe digirin . lê metirsîyên ku têne pêşberî dadmendiya veguhezyane li welatekî wek sûryayê ewe ku jiber pîrbûna hejmara qurbanîyan û herêm , bajar û deverên wêran , hewldanin dibin bo ku ev pîrsgirêk bi rêya lihevkerîne siyasî di navbera hemû aliyan de pêk were . bi vî awayî re li ber serweriya yasa û sizakirina çaksaziyê ve tê girtin yan teng dibe. Jiber vê yekê David Tolbêrt serokê navenda navdewletî ya dadmendiya veguhezyane nivîsî bû ku ' wê dadmendiya veguhezyane dê alîkariya sûryayê bike , lê wê ne çareserîyeke lezgîn be'

<http://ictj.org/ar/node/14> . international center for transitional justice.
<http://ccsdsyria.org/> center for civil society and democracy in syria
<http://www.syriaaccountability.org/> . syria justice and accountability center

Zuhrab Qado



Kobanê

Saziya fêkirin û parastina zimanê kurdî



Di 8-9-2013an de, saziya fêkirin û parastina zimanê kurdî – mala nemir Kemal Henan- 160 fênameyên zimanê kurdî li gurûpeke din ji xwendekarên zimanê kurdî belav kir, û du rêzname weke xelat diyarî mamosteyan RONÎ Elî û Imer Klo kir in. Ev çalakî di ahengeke ferh û bi beşdariya xemxurên ziman û ziman hezan de hate lidarxistin, herweha nameya vê ahengê li gorî ku mamosteyê saziyê Arîf Hiso anî ziman ewbû ku, milletê kurd li zimanê xwe yê zikmakî xwedî derkeve û bi stûburiya fêkirinê rabe . Tê zanîn ku evê saziyê berî demekê û dîsan li bajarê Kobaniyê gurûpek bi fênameyan xelat kir.



Şevbuhêrkek ji helbestê re

Helbest yeke ji alavên bingeîn in ji şoreşê re, ji ber vê jî, di çarçewa şoreşa sûriyê de, bi hezaran rist û helbest ji aliyê helbestvanan de, çî di xwepêşindan de, an jî di rûpelên rojname û malperan de hatin bi k a r a n î n . Şoreşa sûriyê tîneke germ da gewriya helbestvanan, û li ser êş û azara jiyane, kuştin.. birçîbûn.. penaberî û wêraniyê, qîrîna helbestê deng veda.. Di vê derbarê de, rêxistina Şêranê ya partiya Azadî şevbuhêrkek ji helbestê re, li naveda partiyê li bajarê Kobaniyê li darxist. Ev şevbuhêrêk hatibû xemilandin bi helbestên Nîroz Zito, Zozan Bozan û Hezar Besrî. Helbestvanan bi helbestên xwe, bi destên beşdaran girtin û ew derbasî hundirê şoreşê kirin .. ji ber wan karîbûn bi wêneyên helbestên xwe şoreş bipejirandana ..

Nasnameya betrolê li herêmin kurdî û bandorin neyênî

Girkê legê



Bertrol ji giringtirîn sêrmîyanin bin xakîye di sed sala bîst û -yekan de jî vê yekê nasnameya betrolê hata naskirin bi zêrê reş desthilate sûrî bi dest kişandine betrolê kir li parizghe HESEKÊ di sala 1980 de bîrin betrolê li seranserê herimê kurdî li roj ava yê kurdistanê peyide di bin jî girngtirîn zevîn petrolê di herêmin de (zevîn rêmilan- zevîn qiratsok – zevîn bebesî – zevîn hemze bêk) zevîn UDA û DICLE av her du kompanînin SÎNÎ ven veberhînan dîkin Hijmare bîrin betrolê yê koleyî 1700 bîrin Hijmare bîrin betrolê yê karmend 1370 bîrin li bandorin betrol yê neyênî gelek hena li ser mirovan û li ser zemînin çendiniyê jî heya 1- çê kirne kolin betrolê li dev dorî bîren av yek bihne ne baş belav di ka 2- xirakirne zimînin çandinyê dema kû bîra di kolin Dema ku şer û pevçûn bi dest pêkir di başûrê herimin kurdî li gundê ALÎ AXA ya ku di keva nêzîkê GIRKÊ LEGÊ de du bîrin betrolê teqîyen û ta neha kesek bi hewara vemrandina agirê bîrê va ne çîwe wek endizyar AMÎN de xwîyendin ku karekî pir giran ji re di ve û kesin teybet- mend di ven karade de karibin vî akirî bi vemrîn û her weha mamoste AMÎN di berdewamiye axiftina xwede got ta av şer ne rûdê em ni karin nîzêk van her du bîran bi bin Li ser pandora vî duyê de li ser tindrostîye mirovan pişîşik ABD REHMAN MIŞO şikera kir û got av dû bi sê rê ye bandora wê li ser tindrostîye mirovan heya di rê ye kişandine bihne av yek êşa kulbûne singê çê dika û kû mirov zêda bihiê bikşênê di be êşa penceşêr yan êşa dil û rê din dema mirov şînahî ne şûyê di rêye xwerinê jî bandora wê li ser mirovan he ya aw ji wek wan nexweşin berî çê de ka û rê ye din di çarim re jî tigdarî yê li ser laşê mirovan çê dika wek êşa gulbûne laş û kû zêda di ba di ba nixweş ya AKZÎMA Her weha mişo rê yin ku mirov karibin xwe bi parêzê ji van nexweşîyan raghand û got di vê mirov xwerin û şîrbetîn kû vîtmîn (c) tê de bi aweyek zêda bi xwê wek tê zanain vîtmîn (c) bihtirîn di şîr û hêk û şînahî û fikî de heya Her wahe welatin ku di herêma girkê legê de dijîn dexwezî ye bersiveka lezgîn ji van aloziyî pir zehet yê ku bi ser milat de tîn û pandigên li hemî hêzin ku li ser zamîne kû rê bidne karmendin betrolê da karibin van her du bîran bi vamrînin

Ji Bandorin batrolê yê nayênî jî bilî bandorin tindrostî pandorin aburî jî hena li ser milatê kurd wek dûrkirna karmenidin kurd ji kompanî batrolê di herêmin kurdî de bi teybatî piştî raparîna qamişlo sala 2004


Gulal liyanî





Dilê welatê min

Koçberim ez malwêran im



Koçberim ez malwêranim, koçberim ez dilkovanim rêk û pêkên rast dizanim, lê li doza xwe şaşvanim.

Ez bibawerim kû her mirovek koçber ji gelê me yên kurd van hevokan dilorîne çi bi awayek eşkere be, çi di qurçika raze û nehînen xwe de be, ji ber ew dizane kû hijmarek mezin ji wan ne ji bo qilindariyê û hejariyê barkirine û xaka xwe û malê xwe, û cih û warê xwe li paş xwe hêlane, belê hijmarek baş ji wan tirs û sawa mirinê û ezeziya ksayetiye ew bi pêlên xwe yên dijwar re şopandine. Ewin yê kû ji wan re dibêjin "Kesên ruh yan rewan şêrîn", yên kû jiyana xwe ya kesayeti, û ya zarokên xwe bi xaka welat û bi gel û milletên xwe bi tevayî nadin, û van hemî tiştan qurbana xwe û malbata xwe dikin. Eger ne wisa ba wan xwe bi qirşikên keleka koçberiyê ve girê nedidan û xwe ji metirsiyên li ser welat de tene şopandin rizgar nedikirin. Helbet her kesek ji gel jiyana aram dixwaze, her yek ji wan qesta jîngeha xweş û dewlemendiyê dike, ji xwe re û malbat û derdorên xwe re, lê aramiya mezin ewe rizgarkirina welat û azadkirina gel û millet û xweşiya bi rûmet di paxila çêregeha xaka serbest de peyalên samaniyê dinoşe.

Raste mirin zore, zordarî û koletî ji wan zortî re, û raste mirin bi awayên kirêt û hovîti dijware û nayête qebûl kirin lê ya rast ewe kû mirin narvîna her jîndariye di dawî de, çi temen dirêj be yan jî temen kurt be, vêca madem mirin para me hemi-yane çima em bi mirinek bi rûmet re derbasî himbêza xaka sar û bar nabin? Çima em ji girtin û kujtin û revandinê bitirs û sawin? Eger em jiyana bi rûmet û serfiraz dixwazin piwîste em qurbaniyan pirtir bikin. Çawa emê mafên xwe bi dest bînin eger em qurbaniya di rêka pêkanîn û bikaranîna wan de nedin?!

Di vî derbarî de piwîste em erê bikin kû gelek kes ji gelê me û milletê me li pilanên koçberiyê û biyaniyê siwar dibin di bin dara zorê de, û ji encama sedemên zor û neçar, ev kes em dikarin li nîr û derfetên wan yên bê çare agahdar bin, lê ji bilî van tiştan gereke koçberî tiştê herî dawî be ya kû gelê me, milletê me pê bifikire.

Narîn Umer

narinomer76@gmail.com

Kurdno koçnekin

Kurdno koçnekin û merin

Hemû dijminên me li ser koçkirina me yekin

Hûn baş dibînin,

Hemû dewlet û opzosiyoona Sûrî bêdengin!!

Merin û koçmekin, mayîn û koçberî neyekin

Mirina birûmet û nanê koçberiyê ne wekhevin

Kurdno koçnekin û merin

Li Rojavayê welatê xwe bimînin û dermekevin

Da hûn nebin kole û xizmetciyên sexte kesin

Û nemalî keling û nivînen bav teresin

Û ranezin li bin çadiran wek pez û qerecin

Kurdno koçnekin û merin

Welatê xwe nehêlin û xwe erzan nekin

Dijmin û neyaran koçkirina me daxwazdikin

Xwe biyekin û bimînin û çek û topan hilînin

Û van tundrew û çetan ji warê xwe derînin

Kurdno hûn kanî hîro koçbikin

Lê hûnê çawa paşê vegerin?

Nehêsane vegera warê xwe û male

Piştî ketin destên neyar û dijminane

We nedît rewşa Felestîniya li pêşiya çavane

Û rewşa kurdên başûr sala 1991` ne

Koçberî xerabmal û wêrane

Û wendabûna xaka niştimane

Kurdno jiyana nebes av û nan û rehet razane

Jiyana rûmeta mirov û niştimane

Daxwaz û hêviya min ji her kurdek dilovane

Bimîne li mala û warê xwe, li Kurdistanê.

Beyar Robarî





Êvara helbestê



Êvar dadikeve odeya te, weke keçika te bi sînga te ve hildikişê_ tu haj xwe heyî? Çendî hewl bidî tu ê nikarî bî vê kêlikê bigrî, vê êvarê û ew destê xwe dirêj dike maseya te, kursiyê mîvanan û bi te re qehweyê vedixwe_ dest bi helbesta xwe dikî. Êvar hundurê te ji te dişo û te bi tevî şîniya xwe dike, zelaliya xwe û li te dibare. Tu nuha êvar î di helbesta xwe de, diçî, bi rojê re çûyîava, tu li rêyên êvarê hest dibî ku hildifirî, tu hildifirî xwe û kêlikên neynikek...

Êvar li bîra te tîne ku tu îro neçûyî kar, derneketî ji malê, te û kesekî negirte hev îro, te sixêf nekirin û jina ku mast di rê de difroşe nebeziya pêş te, bi hemî ciwaniya xwe, ji te re negot(Canê min tu hatî). Jina çil salî ku porê xwe bi hatina te re weke vê êvarê diweşîne qena sibeha te destpê bike, tu jî . Êvar jineke çil salî ye. Wîlo tu dikarî ji helbesta xwe re bibêjî û çavên xwe li çixareyên xwe bigerî. Tiştê gereke te hişiyar bike ji êvara te, ji çûyînan, ji hevalên te yê girtî, ji şehîdên ku dimrin û te sax dihêlin di mirina te de, li paş xwe. Êvar wellatê te ye. Wîlo jî tu dikarî ji helbesta xwe re bibêjî , tu dikarî bibêjî ku wellatê xwe bedew weke vê êvarê dixwazim, weke zelaliya vê êvarê_ xwînê rawestînin... Dest bi xwe dikî tu. Hinek ji te ne ji te ye. Hest dibî, hinek ji te yan tu tev li dereke din î. Ez baş im, derbas dibe, ger ez tirimbêlek ba wê min xwe gihan-diba gaziya herî nêzîk. Ji hevala xwe re dibêjî di telefonê de û serê xwe dixî ber xwe de, tu dikarî serê xwe deynî ser himbêza hevala xwe jî ger bixwazî, ew ne li vir e, tu dikarî serê xwe deynî ser himbêza vê êvarê û helbesta xwe berdeyam bikî, bihijmêrî şehîdan_ şehîdên wellatê xwe_ bigrî bi dayêkê wan re, bi zarokê wan re bilîzî

û bi hevalan re rahêjî darbestê wan vê êvarê, tu diçî, tev diçî û êvar her roj ew êvar e, normal e êvar, lê helbesteke li ser êvarê gereke weke êvarê be, bi xemgîniya êvarê be û weke êvarê xatirxwestinê bistirêne_ te nas kir? Xwebidehev weke ku tu li ber ketina dawî bî, destê xwe li ser laşê xwe re bibe, xwe nas bike_ mirovên weke te gereke xweşik bimrin bi êvarê re, xweşik xatir bixwazin ji xwe, ji şehîdan. Êvar daweta xatirxwestinê ye û tu di himbêza êvarê de xatir dixwazî, xatir ji te dixwazin ewên ku tu nabî, nas nakî, besî te ye ev êvar ku tu bibêjî ez jiyam rojekê, min hez kir ... Êvar şêlûbêla odeya te diçirîsîne, cilên te yê avêtî aliyan jî, peyalên qehwê, pirtûkên ne xwendî, ava rijiyayî û bêhna hevala te ku maye sibehê. Ancex tu karîbî bistirêni vê êvarê û ew te dibe xwe, ew te li xwe niştêcî dike. Wellatê te ye êvar, te ev nas kir û li asîman dinihêrî, kevok li bîra te tîn, ne ji tiştêkî re. kevok weke êvarê ne û hew, weke baranê ne, weke xwîna ku diherike ji ciwanên wellatê te, ji wellatê te, ji hellbesta di nav destên te de vê êvarê, xwîn kesê e, lê çavên wan sor in. te rojekê wîlo got. Xwîn êvarê ber bi devê xwe de diçirîsîne. Helbesta te dibêje nuha û çavên te şîr tîn, rihê te diherike weke ku çemek be û weke ku tu êvar bî tu xatir dixwazî ji şehîdan, ji xwe û helbesta te xatir dixwaze ji êvarê, ji te...

Ciwan Nebî

bo çî hem wek bira tiv bi hev nakevin
lê çira wek gura em bi hev dikenin
pir bi rûmet bibin kar û bîr û qelem
jîn bi me xweş dibe tev bira bin bê setem

Cîgerxwîn





4 / Pênûs û Pirtûk

Rizoyê Xerzî

Weke me berê gotî, li rojavayî Kurdistanê pir şêwên helbestê hatin bi karanîn, bi celbê nûjenî, û bi xwe helbestvanek heye bala merov dikşîne di vî warî de, ew bi xwe Rizoyê Xerzî ye, û azmûneke wî taybet û cuda di nivîsandina helbestê de heye, çî ji hêla ristina hevok û wate û wênan be, çî ji hêla naverok û hûnandina hest û raman û bûyan be bi hev re.

Pirtûka navdarê me Rizo Xerzî tê navkirin bi navê: (Dema Çavên Te). Ji 84 rûpelan tê pêkanîn, û ji 32 perçe helbestan hatiye berhevkirin.. û di rûpela pêşîn de jî helbesteke diyarî heye.

Navê pirtûkê jî helbesta hijmar 14 û rûpel 23 hatiye kutakirin ya bi navê: (Dema Çavên Te Keniyan) lê bi jîrkî wî nav kir: (Dema Çavên Te) ta nûjeniyê bide pirtûka xwe.

Belê. tevaya helbestan nûjenin û bi tapên serbest û pexşane hûnandiyê û afiriyê.. û kêma cara helbestvan hevokên xwe bi kêş û rêzkêşan tirazû dike û dixemilîne.

Di diyariya pirtûkê Rizo wiha dibêje: Diyarî.. Welatê bindest/ -Dayika kole û perîşan/ -Yara di zindana bê navnîşan de/ -Biçûkên di navbera sergêjeke (kîmawê) û qutikên boyaxê de/ -Gulîkên di bin potînen gemar de diperçiqîn.. Lê. matmayî nemîne, Ku hêjî cihekî cuda ji evîne re di dilê me de maye.

Me got: ku helbestvan Rizoyê Xerzî dikare hûnandina hevok û bûyer û wênan tevî hev di rastî de afrandineke balkêş bide, weke mînak helbesta serke (Derveder) gava dibêje: Tenê wê şevê/ Xewnek şêrîn dît/ Bê ku riwê xwe bişo.. derket/ Li nav rêwiyên Tirêne.. tevan geriya/ Lê dîsa tenê dageriya/ Kesek li hêviya xwe nedê/ Ji pêv şûşek meya vala/ Û termê helbestekê/ Tişteke li hêviya xwe nedît.

Belê, gelk perçe helbestên pirtûkê bi şêweke bûyerî têne rastin, lê bi hûnandineke hunerî: (Berdewarî) Ne çilmise gulê/ Bi min re li hêvya nazelîne. Bimîne/ Heger hat û te hişk dît/ Ezê bêjim: Ji rondikên bendewarya te -gulê-/ xunava xwe tev mîjt/ Lê, heger yar hat û ez nedît.. Bêje.. na na gulê, tişteki nebêje/ Bi tenê xwe bi dû minde.

Her wiha merov dibîne hin helbest bi zimanekî malane an bi zimanekî herêmî hatine nivîsandin, lê nayê wateya ku ne duruste ev pêg di tore û wêjê de. (Dema buhar derbas bû/ Dengê te zer bû û dilê min/ Ji bendewariyê ziwabû).

Û tişteki din jî heye ku tevaya helbestan perçênî kinin.. û hin ji wan jî bihna welatparêzî jê tînin.. (Guheh) Maçek an du maç/ An tolazîyek li dora jinbiyekê/ Te nakin gunehkar/ Lê dema dijmin/ pêşîrên welat dimijîn û tu bi dilki xweş radizê/ Wê gavê.. Tu xwedan nikare gunehê te hilîne.

Belê. Her wiha ez dibêjim pir wêne hene, pir hevbadokê hevokan hene, û ew bi xwe hunera Rizoyê: de ka em li vê perçe helbesta balkêş binêrin ya bi navê (Tirs):

Mije/ Ka destê te yarê/ Metirse/ Mije kes me nabîne/ Mijankên xwe li min negire/ Min ne sare/ Dengê dilê min û navê te bi hev re difirin/ Mije kes wan nabîne/ Netirse ka destê xwe/ li dilê min bipêçe/ Netirse, mije, kes me nabîne.

-(Dema Çavên Te) 84 rûpel .sala çapkirinê nediya/.



Abeya kurdî

Waneya duyemîn

Nimûne li ser tîpan

Aa

Al- av- ar- bar- dar- ba- ard

Bb

Baran- baş- berber- dibistan- qab- helbest

Cc

Cem- caw- can- ciwan- birc- cejin- encam- encûmen

Çç

Çav- çem- çar- çûk- çiçek- daçek- qoç

Dd

Dem- dar- dest- dil- dad- dibistan

Ee

Ez- evîn- mezin- were- kevir- bedew

Amadekar : Arif Hiso



Ciwanê Abdal



Sorik



JÊDER: WÎKÎPEDIA

Sorik an jî Sorka (bi latînî: Morbili); yek ji nexweşiyên mîkrobîk e, ku ne tenê li zarokan, lê belê li mezinan jî dixîne. Ji mirovekî jî digihe yê din!

Kesên ku sîstema wan a parastinê bi ser keti be, di zarotiyê de derbas kirine, bi sorikê dîsa nakevin. Bi saw û metirsîn e, pir zû belav dibe. Piranî bi Payîz û Zivistanan xwe dide der. Kurtbûna vîrûsan 9-10 rojan didome û paşê vîrûs xwe zêde dîkin.

Hin nîşanên sorikê an jî sorka:

Hêsirên çavan

Di destpêkê de zêdetîna laş

Kuxîn

Herikîna poz (bêvilê)

Di nava mûkoz an jî kewara dev de xalên sorik

Pinkteyên (xalîkên) sorik di çermê zarokê de

Nexweşî, heger komplîkasyonek nehêle û sîstema parastinê bi ser bikeve, di nava çend rojan de derbas dibe û ti zîyanê nahêle. Divê bê zanîn, ku sorik ji bo zarokên hûr û mirovên mezin û jinên ducan dijwar û bi metirsîn e. Hîjyen an jî xweparastina ji mîkrob û vîrûsan û bihêzkirina laş pir girîng in.

Têrapî (Dermankirin):

Dermankirin an jî têrapiya sorikê li ser bihêzkirina laş û hîjyenê ye. Dermaneke taybet li dijî wê nîn e. Bijîşk dikarin hin kombînezonên antîbiyotîkan bi kar bînin. Dermanên êşê, xistina tîna laş jî tîn bikar nînin. Zarokên ku bi sorikê ketine, bi qasî 9-10 rojan naçin dibistanê û di vê demê de, ji bo ku nebe saw, tî tînekirin. Derziya parastinê ya sorikê di 10 mehî de tîn lêxistin. Çêtir e, ku mirov zarokan bi rêk û pêk bibin derzîkirinê.



Hemreng

Peyva wendayî ji 7 tîpa ye meydana Qadî Mihemed bi dardebû Van peyvan çixêz bike

- BADE
- NEWAL
- BEST
- ÇAKÎ
- RÛMET
- PÎNE
- ÇIPÎSK
- BA
- JÎNDAR
- KA
- ŞEVBERKÎ
- MÊRG
- HÊŞA
- KIRÊ
- NIFŞ

B	E	S	T	A	Ç	A	K	Î
Ç	I	P	Î	S	K	Ç	B	A
K	A	Ç	R	A	D	N	Î	J
B	A	D	E	L	A	W	E	N
Ş	E	V	B	Ê	R	K	Î	R
H	Ê	Ş	A	A	G	R	Ê	M
I	K	I	R	Ê	Ş	I	F	N
N	E	Ç	A	R	R	L	I	C
R	Û	M	E	T	P	Î	N	E

* PEYVA WENDAYÎ

--	--	--	--	--	--	--	--





شخصية الكردي على ضوء التاريخ والواقع



لكل شعب من شعوب العالم عاداته و تقاليده الإيجابية ، وإن كنا نجد أن هناك عادات وتقاليد مشتركة ، إلى جانب وجود عادات وتقاليد خاصة بكل شعب ، والشعب الكردي الذي تم تقسيم خريطته بين أربع دول ، هو أحد الشعوب الأصيلة في المنطقة، وله تاريخه وحضارته، وله تراثه وفلكلوره ، كما له عاداته وتقاليد وأساطيره ، شأنه شأن غيره.

إنه شعب قديم عريق، له دوره الكبير في خريطة الشرق الأوسط الحالية ، عبر التاريخ ، والبصمة الأخيرة التي تسجل له ، تكمن في مقام به البطل صلاح الدين الأيوبي في طرد غزاة المنطقة ، وردهم الأديار ، وربما لولاه لكانت المنطقة الآن بالكامل بسلام أخرى ، وصفات أخرى ، وبلغات أخرى ، وإن كان الشعب الكردي الذي استطاع أن يحافظ على وجوده ، وقد قيل عنه " أن جباله خير من حفطت له لغته " ، فإنه استطاع أن يستعصي على محو الهوية و الاندثار بالرغم من أن محاولات كثيرة تمت من قبل الحاقدين على الكرد من أجل استئصالهم، ولكن هذه المحاولات جميعها باءت بالفشل ، وبقي الكرد ، وبقي لغة الكرد ، وبقي التاريخ الكردي ، مع أن هناك لغات أخرى غريبة فرضت عليه.

والشعب الكردي باعتبار أنه شعب عريق ، ذو تاريخ مضيء و ماض مجيد ، فإن ماضيه هذا حققه عبر شجاعته و فروسيته التي يتحدث عنها المؤرخون، وليس غريباً على من له دور كبير في صياغة جغرافيا وتاريخ المنطقة ، وإن كان قد نسي جغرافيته و نسي خصوصيته ، لأنه ابتعد عن الأنانية ، وهو من الصفات السلوكية للمتفاني من أجل غيره، ويكاد التاريخ لا يذكر أحداً غير الكرد أثروا غيرهم على أنفسهم ، وقد كانوا من المخلصين لديانة الإسلامية بالرغم من أن الكثيرين من الشعوب المتعايشة معهم انفذوا عن المشروع الإسلامي ، وأسسوا مشروعهم القومي ، وعلى حساب المشروع الكردي ، و بمباركة و تخطيط البعض من الدول الغربية التي تعد الآن مدينة للكرد

بعد هذه المقدمة فإنه لابد من القول : إن الشعب الكردي الذي آثر غيره على نفسه، وأخلص للرباط الذي يجمعه بالشعوب التي انضوى معها في ظل الإسلام، فإن هذا الفعل كان نتيجة صدقه مع قيمه ومبادئه، ومن خلال ابتعاده عن الأنانية، وتقبله للآخرين، مع إنه دفع منذ تأسيس الدول القومية ثمن ذلك كثيراً من قبل الأنظمة التي تقاسمت خريطة كردستان ، إلى أن انتبه إلى مآثره، واندلعت بعض ثوراته المعروفة، التي رفضت تذويبه في بوتقة غيره ، لأن من حق أي شعب له خصوصيته القومية أن يتمتع بحقوقه المنصوص عنها في المواثيق والدساتير الدولية ، ولهذا فإن القضية الكردية تعد من القضايا الدولية الهامة وإن من يرد التعرف على سيكولوجية الإنسان الكردي ، فإنه يستطيع فعل ذلك بسهولة ، والسبب في ذلك: حبه للجبال، وعدم تخليه عن السهول، شغفه بالشمس، رفضه للظلم والذل ، دفاعه عن كرامة من يعيش معه بدرجة دفاعه عن كرامته الشخصية ، شجاعته، إباءه ، وهذه الصفات جزء قليل من الصفات الكثيرة التي يتمتع به ، ولهذا فهو شعب حي ، جدي بالحياة ، شعب لا يكل ولا يمل ولا ييأس في الحفاظ على ذاته والعمل على تحقيق أحلامه .

هلبست يوسف

تعريفه ، أسبابه

أساليب التعامل معه ، حالاته و علاجها

مشكلة العناد عند الطفل

و قد تصل درجة عناده بسبب إصرار الأم أو الأب إلى درجة تجعله يتقبل أي نوع من العقاب في سبيل تنفيذ ما في ذهنه لإثبات وجوده و للدفاع عن هذا الوجود .
إن إرغام الطفل على الطاعة ليس الطريقة الوحيدة لحل مشكلة العناد فالتعامل مع الأطفال في جو هادئ من الدفء العاطفي يحول بين الأطفال و العناد المرضي .



أساليب التعامل مع عناد الأطفال و تخفيفها :

ينتقل الطفل من مرحلة العناد و التحدي إلى مرحلة التقبل و التكيف خلال السنوات الثلاثة (الرابعة ، الخامسة ، السادسة) من عمره كلما كان الأبوان على درجة معتدلة من الصبر و التعاون و الفهم لسيكولوجية الطفل كلما ساعدوا الطفل على اجتياز هذه الفترة .

إن كل طفل يعتبر سلوك الأيوين مثلاً لما يجب أن يكون سلوكه عليه فالطفل الذي يلجأ إلى العناد و التصميم و الحزم تماماً كلاماً التي تتبع التصميم و الحزم في سلوكها مع الطفل

تعريف العناد : العناد هو التمسك و التصلب بالرأي أو السلوك و عدم تقبل تغييرها بل الإصرار عليها مهما بذل الآخرون من محاولات الإقناع لتغييرها .

أسباب العناد عند الأطفال :

1- تحكم الوالدين بتصرفات الطفل و سيطرتهم عليه و فرضهم رغبات معينة عليه .
2- الجو العائلي المتوتر كأن ينشأ الطفل في جو عائلي غير مستقر تسود فيه التوترات الأسرية و الانفعالية .
3- اختلاف الأبوين في معاملة الطفل كأن يكون الأب في صف الطفل يجب لرغباته و تكون الأم على نقيضه أو بالعكس .

4- عصبية الآباء و كثرة نقدهم للبناء تؤدي عصبية الآباء و ثورتهم لأفته الأسباب إلى عصبية الأطفال و عنادهم و رفضهم ما يطلب منهم مهما كان تنفيذه بسيطاً .

5- محاولة إثبات الذات يمر الأطفال جميعاً بفترة من عمرهم يميلون فيها إلى إثبات الذات و إحدى الوسائل لإثبات الذات عندهم العناد .

علاج حالات العناد عند الأطفال :
إن معظم حالات العناد في السن المبكر تعتبر سلوكاً طبيعياً يتوقف علاجها و التعامل معها على قيام الوالدين بتجنب الأسباب التي تؤدي إليها .

إلا أن هناك بعض حالات العناد تستمر و بصورة حادة إلى سن السابعة و ما بعدها و هذا يحتاج إلى معالجة خاصة على الوجه الآتي :

أولاً : دراسة الحالة الصحية للطفل :

فيمكن أن يكون سبب عناد الطفل و غضبه في إفراز الغدد الدرقية أو سوء التغذية أو الشعور بالإجهاد و الأرق.

أخيراً : نجد أن الطفل كالصفحة البيضاء التي ترزف عليها الأخلاقيات و القيم و التقاليد فلا يوجد طفل عنيد أو مطيع و إنما نحن من نجعل الطفل عنيداً أو مطيعاً بحسب تصرفاتنا و تعاملنا معه و مع المجتمع بشكل عام .



HÎN KESEKÎ EZ NEDÎME



Hûn dizanin di van herdu salên dawîn de eliktirik li Kobaniyê û li derdorên wê tim qut e. Yanî şevêkê tê û çar pênc şevan netê. Xelkê gundên Kobaniyê mecbûr dibin nanê sêlê bikin. Lê ji bo nênan bikin ardû gereg e, yanî qirş gerege. Û hûn dizanin ji cerkî ku eliktirik gîştîye gundan xelkê nanê sêlê terikandiye, û êdî ne qirş û ne bişkulên dewêr kom dikirin ji bo ji xwe re bi ardû kin.

Sito û Pîra Îs mecbûrbûn bi pîrtiya xwe herin çolê ji bo her yek ji wan piştîyek qirş ji xwe re bîne, û pê nênan bikin. Ew çûn di newalan de geriyên li pesarê giran, li ber devî zinaran û du piştîyên xwe danehev, li pişt xwe kirin û sistê sist berve gundê xwe hatin. Ew tî bûn, birçî bûn, gellek westiyên. Li ber qûçekê piştîyên xwe danîn ji bo hewşekî vês kin. Sito bi Pîra Îs re got: Te mesela korta pêş mala Cimo li Kobaniyê bihîstîye?

Pîra Îs: Mesela çi qîzê, tu dikî dîsa mejîyê min lihxînî?

Sito: Na.. na.. qelb reşê. Tiştêkî ecêb wê salê li pêş mala Cimo qewimî. Çito te nebihîst? Kobanî gişkî tê de ma.

Pîra Îs: Bi Xwedê min nebihîst, û qe kesekî ji min re negot.

Sito: Wê salê hukmatê li çarşîya mala Cimo erd kola sebî boriyê avê têkin. Derew rasta xelkê, kort panzde mitran kûr kolan.

Pîra Îs: Lê qîzê tu çiqas gewezeyî, niha wexta va gotinên te yê boşin.

Sito: Sebirsizê, hele çîşkî li ber benî xwe sebir ke.

Pîra Îs: De bêje..bêje..kemoka min

Sito: Rokê dîsa ew quzilqurta ku pê kortan dikolin, diranê xwe yê hesinî di erdê de çik kirin, û gava ew çeperê xwe rakir di nav diranên wê de peyak derket.

Pîra Îs: Wa..wa.., dêmek ew dera wextekê merzel bû.

Sita: Na..na..aqilkêmê. Peyakî sax derket. Porê xwe mîna ê jinan dirêj bûbû, dirnax mîna dirêşan bûbûn, riyê xwe mîna riyê miftiyê gundê Xensê gîştibû ser navika wî.

Pîra Îs: Wîşşş... qotik lêketê.. tu bi mi dikenî.

Sito: Bi serê min û te, bi Xwedê tîala ez bi te nakenim. Dibêjin ji wî peyayî pirs kirin: law tu di vir de çidîkî?

Pîra Îs: Êêê wî çi got?

Sito: Wî got law min û hevalên xwe çavqurçonekê lîstin, û va panzde salan min xwe di vê kortê de ji wan veşartîye, û hîn kesekî ez nedîm.

Salih Bozan

Kulîlkên
Kurdistanê ...

Reng

Em dibêjin na na

Em dibêjin erê

Na ji bo rengên tarî

Bo rengên geş erê

Kesk û sor zer û sipî

Ewin rengên salê

Kesk û sor zer û sipî

Ewin rengên alê

Havîn çû payîz hat

Wê zivistan werê

Piştî van demsalan

Wê buhar veşerê

Sipî çû kesk da dû

Rengê zerjî berê

Meha sor dormedor

namîne wê herê

rengêk tê yek dicê

wiha jîn digêrê

Ji bo van çar rengan

herdem bêjin erê

Salih Demîcer





ولات (ثقافية . عامة . مستقلة) . نصف شهرية

welat.press@gmail.com

(العدد 5) تشرين الأول 2013

www.facebook.com/Dengekurdistanasurya